

# KEMPERANDINA HORÎKÎ Û KURDIYA NÛJEN

*Hevokek ji nameya şahê mîtaniyan Tuşrata, ji bo fîrawûn Amenhotepê III-mîn*

**Ali Husein Kerim**

Serdema XIV-mîn B.Z., xanedana XIII-mîn, fîrawûn Amenhotepê III-mîn deshilatdarê Misrê bû (B.Z. 1390-1353). Dîrokzanan, hukumdariya wî, wek serdemeke aşîtiya navbera dewletên herema Asya-Nêzik û pêşvebirina Misrê destnîşan dikin. Amenhotepê III-mîn şûna şer û qirejiran karê dîplomasiyê berfireh meşandiye. Herwiha, wî heman siyaseta aşîtiyê û dîplomasiyê bi dewletên kurdan ên wê hingê re (*Mîtanî- Karduniyaj, Arzava, Alaşiya, Ugarit, Qatna, Xazî, Gûdasûna, Qadeş, Kûmûdî, Zibrîbasanî, Qerqamûş, Xazor û hwd*) jî pêkîniye. Tiştê herî girîng ew e ku tîkiliyên dîplomasiya wan bi nameyên dîrokî îro li ber dest in. Ji ber ku Amenhotepê III-mîn nameyên ku jê re hatibûn şandin, xistiye arşîvê. Cihe ku ev arşîv lê peydabûye li El Amarnayê ye. Ji ber vê sedemê arkeolog û dîrokzan ji arşîva Amenhotepê III-mîn û kurê wî Amenhotepê IV-mîn re dibêjin nameyên El Amarna. Hemû bi remza EA (El-Amarna) hatine tesnîfkirin.

Hejmara nameyan 382 ye û ser kevalên ji kîlê bi tîpên mixî hatine nivisandin. Pir balkêşe ku Ji behtirî nivê wan ji hêla şahên kurdan hatine şandin. Zimanê karhatî akadî ye, lê bi tenê yek bi zimanê kurdî ye (akadî hingê zimanê dîplomasiyê bû). Ev jî dest nîşan dike ku, hingê ji nav arîstokratên Misrê, yê kurdîzan gelek bûn. Heta şahbanû û gelek jinên arîstokratên Misrê jî kurd bûn.

Nameya kurdî ya behsa wê tê kirin, ji hêla şahînsahê mîtaniyan Tuşrata hatibû şandin û dirêjîya wê 500 riste ne, di bin remza EA 24 hatiye tasnîfkirin. Helbet kurdîbûna nameyê eşkereye, ji ber ku bi zimanê kalbavên kurdan horî-mîtaniyan hatiye nivisandin. Ango kurdiya 3500 salan berê ye.

Di vê gotarê de lêkolîn ser hevokekê tenê ye û ev hevok jî ne bi taybet, bi awayekî rasthatî hatiye hilbijartin.

## **Kurdiya horîyan:**

“*nîgāri-mān kur-o šēn(a)-iffu-ž fur-êd-a*” (Mitt. iii 15)

Kurdiya nûjen:

“Birayê min ê diyariyên xwe bibîne”

## **Analiza hevoka jorîn bi zimanê kurdî:**

<b>Horîkî</b>	<b>Kurdî</b>
nîgar	nîgar, wêne, diyarî

<i>niġāri-mān</i>	nîgarên min
<i>kur-o</i>	kir, kira, kiro, (di)kare/dikira
<i>šen(a)-iffu-ž</i>	şênîyî jî, şênîyîş, şênî zî Di horîkî de “ <i>şeni/şena</i> ” tê wateya “bira”; lê şênî di kurdiya nûjen de wek “şênî” tê bikarînan û tê wateya: “kesê heman deverê”, “heman ciyî”, “heman xwînê.” mînakî: “Şênîyê malê” hwd.
<i>fur-êd-a</i>	fêrê da, ferî be, awir da, wurya da, rewanî da, rayê da, rûda, rûde

<b>Kurdiya hevokê şewazê hezrî</b>	<b>Kurdiya şewazê hevdemî</b>
Şênî zî kare nîgariman fêrî biba	Şênî dikare diyariyan fêr be
Şênî kira nîgarê xweman awirde Nîgarîman kira şênîyîş rayîda	Şênî jî dikare awir bide nîgarên xweyan/man; Şênîyîş vinayena nîgareman; Şênîşî nîgareman wurya kir; Nîgarîman kira şênîyîş ra rayîda Nîgariyan dîkin şênîyî ra rayîdin Nîgaran şênî zî/jî kare rûberû be.
Nîgaran şênî zî kare rûbide	

Di tabelên jorîn de kemperandîna hevoka kurdiya pêş 3500 salan û ya nûjen bi şewazên hezrî û nûjenî hatiye selimandin.

Ji bo du ziman bişibên hev çend mercên sereke pêvîst in; ji wan re dibêjin: *semanatîk* (watanasî), *fonetîk* (dengnasî) û *sîntaks* (hevoksazî). Ji nav van hersê mercan bi tenê di rêjeyeke % 30 hevoksazî newekhev e. Helbet sedemên vê yê nîroki hene. Horîkî û Hînd-Îranî dema tekilhevbûne hevoksazî jî hinekî hatiye guhorandin. Jixwe biguhorandin û pêşveçûna civakê re ziman jî xwe nû dike. Her wisa zimanê kurdî jî xwe nûtir û zelaltir kiriye.